## Qeydbûna ji bo derzîkirinê li Saarlandê

Li Saarlandê mirov dikare li cem doktorê xwe, an ji di yek ji çar navendên derzîlêdanê de, li hembera corona virûsê derzîkirinê pêk bîne. Heke mirov bixwazê di navenda derzîlêdanê de derzîkirinê pêk bîne, divê mirov berê xwe li ser lîsteya derzîlêdanê de, qeyd bike.

Ev yekê bi yek telefon kirinê ve, yê li cem Corona-Hotline: 0681 501 4422 an ji 0800 999 15 99, tê pêk anîn.

An ji dîsa bi rêya onlîne li ser malpêra înter-netê: www.impfen-saarland.de, dikare were pêk anîn.

Gava hûn tercîh dikin kû li cem doktora / dok-torê xwe, derzîlêdanê pêk bînin, wê gavê hûn dikarin ji bo bêtir agahdarîyan bi doktora xwe re / doktorê xwe re, rasterast têkilî pêk bînin.

## Bandorên alî yên derzîlêdanê pê re

Ew yekê normale kû piştî yek derzîlêdanekê pê re hinek bandorên alî rû bidin.
Bandorên alî yên pê re dikarin nîşan bidin kû laş li hembera derzîlêdanê reaksîyon nîşan bide û antîkoran çêbike.

Bi gelemperî ev reaksîyonên hembera derzî-krinê hêsan in û di nav çend rojan de derbas dibin. Reaksîyonên kû pir caran pêk tên, wek nimûne, reaksîyonên di devera derzîlêdanê de, wekî êş, sorbûn an ji werimîn an ji êşên hêsan yên laşê, wekî serêşî, bêhalî, made lihevketin. an ji agir, in.

**Têkilî û çapkirin:**
Ministerium für Soziales, Gesundheit, Frauen und Familie
Franz-Josef-Röder-Straße 23
66119 Saarbrücken

www.impfen.saarland.de

/MSGFF.Saarland
/msgff.saarland
/MSGFF_SL

Saarbrücken Gulan 2021

Ministerium für Soziales, Gesundheit, Frauen und Familie

SAARLAND

# Derzîlêdana - koronayê li Saarlandê

Bi yek derzîkirinê, di bûyera yek enfeksiyona bi vîrusa COVID-19 de, pêşîlêgirtina pêvajoya giran ya nexweşiyê dikare were asteng kirin.



Kurdî

Ministerium für Soziales, Gesundheit, Frauen und Familie

SAARLAND

## Derzîkirina Parastinê ya - koronayê

Bi yek parastina derzîkirinê hûn xwe, xizmên xwe û kesên kû bi we re têkiliyê we heye, wana diparêzin. Bi derzîkirinê divê hem yek belavbûna vîrûsa – koronayê were asteng kirin, her weha jî encamên tenduristiyê yên gengaz yên yek nexweşîyekê COVID-19 werin kêm kirinê.
Derzîkirinê anegorî dilxwazîya însanan e û belaş e. Hemî dermanên derzîkirinê baş têne tehemûl kirin, ewlehî û pir bi bandor in.
Bi derzîkirinê her hemwelatîyeka jin û her hemwelatîyekê zilam dikare di derbarê tekoşîna bi pandemîyê re, yek tevkarîyekê pêk bîne.

Niha li Almanyayê ji bo çar dermanên derzîkirinê destûr hatîye dyîn: Cormitary, Moderna, Astra-Zeneca û Janssen. Ji bo yek derzîkirina tevahî, ji xeynî Janssen, di hemî derzîkirinan de, du car derzîkirinê hewce dikin.

Derzîkirin di çar navendên derzîlêdanê yên sazkirî de (Saarbrücken, Saarlouis, Neunkirchen û Lebachê) û her weha li cem 850 muayenexaneyên bijîşkî yên li Saarlandê têne pêk anîn.

## Komên kû pêşanîya wan hene

Vê gavê tenê mîqdarên bi sînor yên dermanê derzîkirinê hene. Ji ber vê yekê, ne kû hemî mirov nikarin bi zûtirîn derzî kirinê pêk bînin.
Heya kû dermanê derzîkirinê hîn kêm be, ji bo ew kesên kû herî zêde hewceyê parastinê ne, ji bo wana derzîkirinê tê pêşkêş kirin.
Çar astên pêşanîyê hene.

Vêgavê li Saarlandê edî koma 3 vekirî ye.
Piştî vê komê dor tê hemî kesên kû yek metirsîyekê wan ya kêmtir heye, kesên kû yek pêvajoya giran ya yek nexweşîyekê COVID-19 dikişînin an jî kesên kû ne bi metirsîya (pir) giran ya enfeksiyonê re rû bi rû ne.
Hûn dikarin li ser xeta telefonê ya hotlinê 0800 999 15 99 telefon bikin, da kû hûn fêr bibin, gelo kengê hûn dikarin derzîkirinê pêk bînin.


## Pirsên kû tim û tim tên pirs kirinê û bersivên wan.

**1. Gelo gengaze tevî kû mirov derzîkirinê pêk bînê, lêbelê dîsa jî korona vîrûsê derbasî mirovên din bike?** Li anegorî texmînên Enstîtuya Robert Koch, kesên ku derzîkirinê pêk tînîn, ew kes kêm caran virusê derbasî mirovên din dikin.

Hin kes tevî kû derzîkirinê pêk anîne, lê dîsa ji bi virûsa koronayê dikevin, lêbelê paşê vîrus di mîqdarên piçûk de xwe vedibêje û zûtir winda dibe. Lêbelê dîsa jî mirovên kû hatine derzîkirinê, hîn jî mecbur in kû rîayetê tevdîrên parastinê yên gelemperî bikin.

**2. Dermanên derzîkirinê çiqas ewledar in?** Li Almanyayê, dermanên derzîkirinê tenê heke ewana, hersê qonaxên bernameya lêkolînê klînîkî bi serfirazî derbas kiriye, dikarin destûr bigrin. Ev standardên kalîteyê yên neteweyî û navneteweyî, hem di hemî geşedanên dermanên derzîkirinê yên din de û her wisa di destûr dayîna yek korona virûsê – derzîlêdanê de jî, derbas dibin.

Piştî destûr girtina ji bo firotinê bikaranîna dermanê derzîkirinê berdewamî were şopandin û nirxandin.




**3. Gelo dermanên derzîkirinê yên – mRNA DNA yê diguhezin?**
Na, pêkhateya meya genetîkî bi yek dermanê derzîkirinê ya mRNA nayê guhertin. Yek entegrasyona RNA di nav DNA yê de negengaz e e.

**4. Gelo derzîkirinê bandorê li berhemdarîya zayînê dike?**
Dermanên derzîkirinê heyî yên COVID-19 li ser mezinan – her wisa li ser jinên kû dixwazin zarokên wan bibin, hatine ceribandin û ewle û bi bandor hatine dîtin. Ew îdaya kû derzîkirinê dikare bandorê li ser berhemdarîya zayînê bike, çewt e.

Di ceribandinên klînîkî yên berfireh yên dermanên derzîkirinê yên SARS-CoV-2 de, tu delîl nehatîyê dîtin kû ew ziraré bide berhemdarîya zayînê ya mêritî an ji berhemdarîya zayînê ya jinitî.

**5. Min nexweşîya Corona derbas kirîye, gelo divê ez dîsa jî derzîkirinê pêk bînim?**
Mirovên kû ew nexweşîyê derbas kirinê û baş bûne, ji wana yên kû bi teşxîsa laboratuvarê hate pejirandin kû bi wan re enfeksiyona SARS-CoV-2 heye (PCR-pesend kirî), divê ew zûtirîn şeş mehan piştî başbûna xwe yek yekcarî derzîkirinê pêk bînin. Li vir hemî dermanên derzîkirinê yên COVID-19 yên kû hatine destûr kirinê, ew dikarin ji bo vê yekê werin bikaranîn. Piştî yek enfeksiyonê, ji sedema derzîkirinê yek bersîvekê parastinê ya pir baş pêk tê.

Agahdariya bêtir bi zimanên cûda li ser malpêra:

www.saarland.de/corona-integration dikare were xwendin.